
Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.


Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (154) Sal 27 03 Mijdar 2022 z - 2634 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S

# Agirê koçberiyê deverên Kurdî dişewitîne !





**Desteya sernivîser**

Ne tenê dewleta Turkiyê, lê belê rijêma Sûriyê û dewleta Îranê jî, ji hebûna Rêveberiya Xweser a ku sala 2013-an li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hatiye damezrandin çavtengiyan dikin, bi armanca tunekirin û binaxkirina wê, ew bi hev re planan datînin.

Ji mêj ve ye ku gelê Kurd ê kevnar, lawê MED û MÎTAN, bi mêrxasî û girêdana xwe ya asê bi xak û welatê xwe ve hatiye naskirin, rehên xwe kûr di axa bav û kalan de berdane. Ji ber wê hindê jî, wî xwe li ber bayê tunekirin, pişaftin û windabûnê ragirtiye û mîna gelekî xweser, xwedî taybetmendiyên cuda, xwe parastiye.

Yek ji planên herî dijwar û metirsîdar ku îro li dij gelê me û Rêveberiyê, bi rêbaz û zanebûn ketiye rojevê, valakirina deverên Kurdî ji xelkên wê yên resen e!

Li Efrîna dagirkirî ku rêjeya Kurdan lê 97% bû, ji ber kiryarên hovane yên dewleta Turkiyê û çeteyên girêdayî wê ve, ew rêje daketiye 30%!! Û xelkên biyanî li şûna koçberan cîwar kirine. Herweha, li ..... 2

## Keça Kurd Jîna Emînî li Tehranê hate kuştin!

**Desteya sernivîser**

Li roja 13ê meha Êlûnê, keça Kurd a bajarê Seqiz li rojhilatê Kurdistanê Jîna Emînî ya (22) salî, bi karekî diçe Tehranê. Li wê derê, di çarçiyê de, pêrgî komeke polîsên (qaşo) sinciyê dibe, ewên ku serûka jinan kontrol dikin! Bi behaneya ku desmala serê wê ne li gora zagonên ola Islamê ye, porê wê ne nuxumandî ye,



radibin bi tundî û şêweyekî hovane li keça Kurd dixin û kûr wê birîndar dikin ta ku ew ..... 5

## Pirsa mezin ew e: Ta kîjan astê emê kurdperwer bin?

**Mihemed Dillî**


Roja Înê 23.09.2022-yan malbata malpera TÎRÊJ EFRÎN li bajarê Bergheim-Kölnê li Elemanya, bi boneya derxistina pêncemîn albûma xwe ya bi navê (Destana vegerê), û beşdariya pêkhateyeke çandî, zanistî û hunerî ya Kurd ahengeke hunerî lidar xist.

Xelata Mertala 2022 ya dehemîn a Malperê pêşkêşî 6 kesayetiyên ku xizmeta çanda kurdî kirine, cefa dîtine kirin û rêzname dane piran.

Di sîwana heyameke hunerî, çandiyeke kurdî de, beşdaran rojek xweş û bi coş, dilşewat borandin, kesên ji dehsalan ve hevdu nedîtibûn, hev hembêz kirin, ji hev pirsîn ku: Ji malbatê kî li gund û welêt maye?

Bi rastî ..... 2

# 31 Sal ji terorkirina wî… Ebdilhemîd Zîbar zindî ye, jibîr nabe!




**Bi armanca birrîna dengê rastî û dilsoziyê û çavtirsandina têkoşer û xebatkarên Kurd, bi destên çepel û biryara karbidestên dewleta Sûriyê, roja Pêncşembê, 10-ê Çiriya Pêşîn-a 1991-an, li nav darên zeytûnên xwe, bi xinizî ew hate kuştin!**

**Ebdilhemîd Zîbar, li gundê Memila, sala 1943-yan ji dayik bûye, li zanîngeha Helebê Beşê zimanê Erebî dixwend û li gundên Babê, Ezazê, Kobanê û Kurdaxê ji sala 1973-1986-an mamostetî dikir, û ji ber kar û xebata wî, sala 1987-an, bi biryareke ewlehiya dewletê, ew ji karê mamostetiyê hatiye bidûrxistin.**

**Eve 31 sal di ser terorkirina heval Ebdilhemîd Zîbar re derbas dibin, û tevî rewşa Kurdan bi gelemperî û ya Çiyayê Kurmênc bi taybetî ya zor û dijwar, Ebdilhemîd zindî ye, bi me re dijî. Ew jibîr nabe!**

**Agirê Koçber... Dûmahîk**

Serê Kaniyê û Girê Spî jî, projeya guhertina demografîk lidar e!

Li Herêma Cizîrê jî, bo heman armancê, dewleta Turkiyê dixwaze vê Rêvebriyê birûxîne, ji hundir ve seqet û pûç bike. Gefên dagirkirinê, digel bombebarankirin û terorkirina xelkên wê bi rêya balefirên bêajovan li pêş çavên dewletên mezin ên xwedî rol, rojane mirinê belav dike, hêminî û aramiya deverê têk dibe, tirsê di dilê welatiyan de diçîne, aboriya deverê dişkîne, agirê buhabûnê dil û eniya xelkên me dax dide û berê wan dide koçberiya malwêran!

Li hemberî vê plana rêvin û gemar ku welatê me ji xwediyên xwe vala dike, ustubarê Rêveberiya Xweser ew e ku bi zûtirîn dem, ew bi erkên xwe rabe, ji wan:

- Xweşkirina rewşa aborî ya xelkên me, û kêmkirina baceyê li ser metiryal, kelûpelên ku ji derve derbasî welêt dibin, û kontrolkirina buhayê firotina hemî pêdiviyên jiyanê ye, da ku bazirgan li gora dilên xwe welatiyan talan nekin.
- Peydakirina derfetên kar ji xelkê re, da karibin pêdiviyên jiyana xwe dabîn bikin.
- Pêşkêşkirina sûtemeniyê ji projeyên çandiniyê yên avî re.
- Vekirina projeyên geşepêdanê.
- Rê li pêş gendeliyê û diziya gel bê girtin, û gendel radestî dadgehan bibin da ku sezayê xwe yê dadmend bibîbin.
- Avakirina baweriyê di navbera welatiyan û Rêveberiyê de, ta bigihe radeya ku welatî xwe xwediyê wê bibîne û berevaniyê di ber de bike.

Bila em bawer bin, eger rewş wiha berdewam bibe, welatê me ji xelkên xwe vala dibe, rêjeya hebûna wan kêm dibe, û projeyên neyarên hebûna gelê me bicih dibin. Ji ber vê hindê, ji hemî xebatkar û xêrxwazan tê xwestin ku ji bo beravêtina vê projeya nemirovane dest bidin hev û xebateke bêwestan bikin!

**Pirsa mezin... Dûmahîk**

dilşewetîn, şadbûn di dil û li hevpirsînan de tevlî hev bûn, lê mera kane bêjê wekî hunermendekî li wir bi denkirina zarava kurmancê Efrînê got: (Li Çiyayê Kurmênc, em malek bûn). Rast e, lê ya rasstir ew e ku malbatek kêmtirîn zarok bûn. Di wek vê bûyrê de mixabin nivşê nuh pir kêm in û kêm dibin!

Ev jî ustubariyek ne kêmî pir ustubariyan e, ku ziman, kultûr, huner werin parastin, nifşên nuh pê fêr bibin, da ku bimînin kurd, bi doza welatê bav û kalan ve girêdayî bimînin. Di dibistanên xwe de derfetê bistînin, fêrî zimanê xwe bi fermî bibin, da ku bimînin kurd, wenda nebin. Da ku rêzgirtina dê û bavê xwe winda nekin.

Pir giring e her kesê koçbarî welêt bûye di mal de, di dewatan de, ne tenê bi kurdî biaxife, guhdarî stranên kurdî bike, di mal û gera xwe de, beşdarî pêşengehên hunerî bibe, ji zarokên xwe re wan huneran şirove bike, da ku ew zarok rêzdariya wan nas bikin, rêzdariya gelê xwe bigrin ku ew jî mîna







her mirovekî, her miletekî vê cîhanê merov in, milet in, xudî maf û welat in.

Pirsa mezin ew e: Ta kîjan astê emê kurdperwer bin, da xwedî DESTANA VEGERÊ BIN?!

# Armanca Turkiyê ya sereke di Sûriyê de, armanckirina hebûn û destkeftiyên Kurdan e

**Memê Alan**



Rijîma Turkiyê bi serokatiya Erdoxan ji demekê ve hewil dide ku êrişî herêmên Rêvebiriya Xweser bike, wê 30 km ji sînor dûr bixîne, «herêmeke aram» - li gor dîtina xwe - çêke û xelkê Sûriyê yên li hundirê Turkiyê têde bicî bike, bi hêviya ku ji alîkî ve kanibe careke din serkeftina serokatiya Turkiyê ji Erdoxan re misoger bike, û ji alîkî din ve jî Kurdan li Sûriyê lawaz bike û bê rol bihêle. Vêca, ew ji bo Rojavayê Ferêt berê xwe dide Rûsiya, û ji bo Rojhilatê Ferêt jî berê xwe dide Amerîka, bi hêviya ku îşiqa kesk ji aliyekî werbigre. Lê, piştî ku tu çare nedît û herdu aliyan firên jê re lêxistin, neçar ma ku li ber roniya şîreta Rûsiya hevrêziyê bi Şamê re bike, da ku li gel hev û bi piştgiriya Rûsiya û Îranê armancên xwe pêk wîne, û dema ku hin aliyên li ser erdê nerazîbûna xwe ji wê pêngavê diyar kirin, û berê jî ji bo geregoş û serberdayetî, û binpêkirin û tewanên ku li wan herêman, bi taybetî jî li Efrînê, zext û fişar li ser wê hene, vêca Turkiyê bi riya Istîxbaratên xwe ji «Desteya Tehrîr El›şam» û milîseyên ku pir ji xwe ve nêzîk «El›sultan Silêman Şah, El›sultan Mûrad, El›hemzat» xwest êrişî wan aliyên ku ew jê ne razî (El›cebhe El›şamiyê, Ceyş El›îslam...- Feyleq El›şam) li herêmên (Efrîn, Ezaz, Bab û Cerablusê) bikin, da ku wan lawaz bike, yek rêvebiriyê li wan herêman ava bike, di rojên pêş de di hundir Sûriyê de kaxeza guftûgoya xwe bi hemî aliyan re xurtir bike, û çi wextî hat xwestin «HTŞ» li dijî «Rêvebiriya Xweser» jî bikar wîne. Lê, ji ber hin sedemên derve û hundir pilana wî bi temamî neçû serî, û şer hate rawestandin.

Û ev jî çend xalên girîng li ser rewşa nû ya Efrînê ne:

1- Berê û niha jî tu tişt li Efrînê bê Turkiyê çênabe, ji ber ku Turkiyê dewleta dagîrker e.

2- Zext û fişarên ku Amrîka li ser Turkiyê kirine, û xwepêşandanên ku li Ezazê, Bab û Cerablusê hatine lidarxistin hîştin ku Turkiyê şer rawestîne û «HTŞ» şûn ve vegerîne.

3- Rast e ku «HTŞ» hin hêzên xwe ji Efrînê kişandin û rûdanên xwe yên leşkerî yên berbiçav kêm kirin û belkîm tune bike, Encûmenên Xwecihî yên berê û hin saziyên din jî bimînin, lê «HTŞ» dê li Efrînê ji rêvebiriya heyî re lêvegera rasteqîn be.

4- Milîseyên bi ser Turkiyê ve û «HTŞ» ji yek kaniyê çand û ramanên xwe yên terorane wergirtine, lê belkîm «HTŞ» bide xuyakirin ku hatiye xelkê Efrînê ji zor û zordariya milîseyên berê rizgar bike, da ku wêneya xwe li ber çavên raya giştî spî bike.

5- Pilanên ku Turkiyê digerîne - çendî bi dizî jî bin - ji Amerîka û Rûsiya ve ne veşartî ne, lê mixabin helwest û siyasetên dewletan li ser berjewendiyan têne avakirin.

6- Rijîma Turkiyê bi serokatiya Erdoxan ji demekê ve hewil dide ku êrişî herêmên Rêvebiriya Xweser bike, wê 30 km ji sînor dûr bixîne, «herêmeke aram» - li gor dîtina xwe - çêke û xelkê Sûriyê yên li hundir(ê) Turkiyê têde bicî bike, bi hêviya ku ji alîkî ve kanibe careke din serkeftina serokatiya Turkiyê ji Erdoxan re misoger bike, û ji alîkî din ve jî Kurdan li Sûriyê lawaz bike û bê rol bihêle. Vêca, ew ji bo Rojavayê Ferêt berê xwe dide Rûsiya, û ji bo Rojhilatê Ferêt jî berê xwe dide Amerîka, bi hêviya ku îşiqa kesk ji aliyekî werbigre. Lê, piştî ku tu çare nedît û herdu aliyan firên jê re lêxistin, neçar ma ku li ber roniya şîreta Rûsiya hevrêziyê bi Şamê re bike, da ku li gel hev û bi piştgiriya Rûsiya û Îranê armancên xwe pêk wîne, û dema ku hin aliyên li ser erdê nerazîbûna xwe ji wê pêngavê diyar kirin, û berê jî ji bo geregoş û serberdayetî, û binpêkirin û tewanên ku li wan herêman, bi taybetî jî li Efrînê, zext û fişar li ser wê hene, vêca Turkiyê bi riya Istîxbaratên xwe ji «Desteya Tehrîr El›şam» û milîseyên ku pir ji xwe ve nêzîk «El›sultan Silêman Şah, El›sultan Mûrad, El›hemzat» xwest êrişî wan aliyên ku ew jê ne razî (El›cebhe El›şamiyê, Ceyş El›îslam...- Feyleq El›şam) li herêmên (Efrîn, Ezaz, Bab û Cerablusê) bikin, da ku wan lawaz bike, yek rêvebiriyê li wan herêman ava bike, di rojên pêş de di hundir Sûriyê de kaxeza guftûgoya xwe bi hemî aliyan re xurtir bike, û çi wextî hat xwestin «HTŞ» li dijî «Rêvebiriya Xweser» jî bikar wîne. Lê, ji ber hin sedemên derve û hundir pilana wî bi temamî neçû serî, û şer hate rawestandin.

Û ev jî çend xalên girîng li ser rewşa nû ya Efrînê ne:

1- Berê û niha jî tu tişt li Efrînê bê Turkiyê çênabe, ji ber ku Turkiyê dewleta dagîrker e.

..... 4

# Min xweş kir, û we xweş kir!

Kalê Maratê

Hink kes di civaka me de hene wek mirtibên ku pêjna dawetê bikin xwe pelû ser çalakî û merasîmên bîranînan dikin, ne tenê di çalakiyên çand û hunerî de, lê di serxweşî, hawarî û dawetan de jî kesên wiha peyda dibin.

Bêyî ku di pratîkê de bi qasî serê derziyê ked û xebateke wan hebe, Kamera û mîkrefonekê li ku dibînin xwe didin ber, û ji aş û bajar daxivin!

Dixwazin nav û dengê xwe belav bikin, û dema daxivin, wekî ku ew xwediyê wê çalakiyê bin. A rast ew dixwazin navê wan li kêleka hin navên bi navûdeng derkevin pêş, û bi pêlikên wî navdarî ve hilkişin jor, û navê xwe bidin bihîstin, lê dive êdî kesên ku kedê didin û wan çalakiyan lidar dixin, rê nedin van kurtêlxur û li bîranînan li ber kamereyan.

Gelek pêkenok û çîvanok li ser kesên wiha hene wekî mînak ez behsa çend ji van çîrokan bikim carekê mirovek li dawetkê ji dil û can govendê digire û destmala xwe di serê govendê de dihejîne, dema wiha beloq û balkêş xuya dike her kes meraq dike ku zanibe ew kî ye? Aliyê zêve ji hev dipirsin wî nas nakin û dibêjin qey mervê mala bûkê ye. Aliyê bûkê jî ji hev dipirsin dibêjin qey ew mervê zêve ye.

Ez serê we nêşînim dawî, yek xwe nema digire û wiha jê dipirse: Xwedê ji te razî tu kî yî? Tu mervê zêve yî? Yan jî yê bûkê yî, dibêje ez li ser aliyê zavê têm hesabandin. Dîsa jê dipirse, ma tu çiyî zêve yî? Dibêje: Tu dibînî porê zêve çi xweş çêbûye? (Ez) kurê meta porbir Evdilselam im, berberê kû porê zêve birîye!

Wê rojê di bîranîna dostekî min de jî ez rastî çend ji wan mervan hatim, bi taybetî yek ji wan piştî ku pêşiya wî ji alî bîranîna ve hate girtin û nikaribû mirtibiya xwe li ser wê merasîmê ferz bike, pir û poşman di nîvê çalakiyê de derket derve, wek mirtibên bêpar ji dawetekê derkeve, û teyfikek tirşik jî bi destê wî nekeve! Wiha bi serê wî hat, dema hêviya xwe qut kir, toz û dûman bi pey xwe xist û ji cihê bîranînê pengizî.

Min behsa mirtiban kir çîrokeke wan û aliyê dawetê hat bîra min. Xwediyê dawetê devê xwe dide ber guhê zirnevan û jê re dibêje: Heke tu daweta me xweş bikî, taximekî min ê cilan heye min hê du caran li xwe nekiriye, ezê bidim te. Paşê jî xwediyê dawetê devê xwe dibe ber guhê daholvan û jê re dibêje: Cotek solên min ê nipînî hene, heke tu dawetê xweş bikî, ezê wan bidim te.

Piştî van sozên xwediyê dawetê, zirnevan govend xweş û geş kiribû û pê re govend digirt daholvan jî dikir ku ji kelecan û kêfan dahola xwe biçirîne. Dawet gelekî xweş derbas bû. Piştî dawet bi dawî bû, Zirnevan û daholvan berê xwe dan ba xwediyê dawetê û jê re gotin: Çawa bû? Te dît me daweta we çiqasî xweş kir, de îca ji kerema xwe ka soza xwe bîne cih.

Xwediyê dawetê got: Rast e we gelekî dawet xweş kir siheta we xweş be, lê pêşî min ji we re xweş nekiriba û soza taxim û sola nû nekiriba, we ewqasî xweş nedikir. Xwediyê dawetê wiha pê de çû û got: Ez bi serê bavê we kim ne taxim, ne jî sola nû heye, lê em wek hev bûne.

Mirtiban bi hêrs jê re gotin: Çawa em wek hev bûne? Xwediyê dawetê got: Min ji we re xweş kir, û we jî ji me re xweş kir em wek hev bûne!

**Armanca... Dûmahîk**

2- Zext û fişarên ku Amrîka li ser Turkiyê kirine, û xwepêşanda(n)ên ku li Ezazê, Bab û Cerablusê hatine lidarxistin hîştin ku Turkiyê şer rawestîne û «HTŞ» şûn ve vegerîne.

3- Rast e ku «HTŞ» hin hêzên xwe ji Efrînê kişandin û rûdanên xwe yên leşkerî yên berbiçav kêm kirin û belkîm tune bike, Encûmenên Xwecihî yên berê û hin saziyên din jî bimînin, lê «HTŞ» dê li Efrînê ji rêvebiriya heyî re lêvegera rasteqîn be.

4- Milîseyên bi ser Turkiyê ve û «HTŞ» ji yek kaniyê çand û ramanên xwe yên terorane wergirtine, lê belkîm «HTŞ» bide xuyakirin ku hatiye xelkê Efrînê ji zor û zordariya milîseyên berê rizgar bike, da ku wêneya xwe li ber çavên raya giştî spî bike.

5- Pilanên ku Turkiyê digerîne - çendî bi dizî jî bin - ji Amerîka û Rûsiya ve ne veşartî ne, lê mixabin helwest û siyasetên dewletan li ser berjewendiyan têne avakirin.

6- Ger a Amerîka rast e, bila zextê bike, û Turkiyê ji Efrînê derxîne, da ku xelkê Efrînê - yê ku zorane koçber bûye, vegere cihê xwe, û di bin sîwana navdewletî de herêma xwe birêve bibe, ta ku çareseriyeke rasteqîn ji kirîza Sûriyê re bê dîtin.

Turkiyê tucarî ji pilan û hewildanên xwe namîne, carekê bi Rûsiya re û carekê jî bi Amerîka re, belkîm kanibe armancên xwe yên qirêj pêk bîne, lê pirsa mezin ew e, ta kengî wê kanibe li ser nakokiyên herdu aliyan bilîze û sûdê jê werbigre. Bi dîtina min lîska wê dirêj nake, û wê qelengekî mezin li dawiya dawî bide.

- Ger a Amerîka rast e, bila zextê bike, û Turkiyê ji Efrînê derxîne, da ku xelkê Efrînê - yê ku zorane koçber bûye, vegere cihê xwe, û di bin sîwana navdewletî de herêma xwe birêve bibe, ta ku çareseriyeke rasteqîn ji kirîza Sûriyê re bê dîtin.

Turkiyê tucarî ji pilan û hewildanên xwe namîne, carekê bi Rûsiya re û carekê jî bi Amerîka re, belkîm kanibe armancên xwe yên qirêj pêk bîne, lê pirsa mezin ew e, ta kengî wê kanibe li ser nakokiyên herdu aliyan bilîze û sûdê jê werbigre. Bi dîtina min lîska wê dirêj nake, û wê qelengekî mezin li dawiya dawî bide.

**Keça Kurd... Dûmahîk**

ji ser hişê xwe diçe! Wê diguhezin nexweşxaneya Kisra li Tehranê, lê mixabin, roja Înê, 19-ê Êlûnê, ew jiyana xwe ji dest dide.

Ji ber vî karê hovane, xwepêşandan li hin taxên tehranê derketin kolanan, û bi xemgîniyeke mezin, termê pakrewana Kurd a bêsûc û bêguneh li Kurdistanê hate veşartin.

Ji wê rojê ve, xwepêşandan li gelek bajarên Îranê gur bûne, hejmara kuştiyan 250 mirov derbas kiriye, gelên Îranê daxwaza mafên xwe dikin û nema îde vê sitema dewleta Îranê dipejirîne! Ji bo guhertina vê rijêmê, her diçe, mangirtin û xwepêşandanên gelên Îranê berfirehtir dibin.

Bi vê bûneyê, Partiya me, daxuyaniyek bi zimanê Erebî ji çapemeniyê re da weşandin û ev e wergera deqa wê ye:

**DAXUYANÎ**

Ji roja 19-ê vê mehê, meha Êlûnê ve, piştî rêwresma xakpaastina termê keça Kurd a ciwan, pakrewan Jîna (Mehsa) Emînî li bajarê Seqizê/ Rojhilatê Kurdistanê, ew keça ku bi behaneya nedurstiya serûka wê li Tehranê, ser destê kujerên ku bi navê»Polîsên Sincê» têne binavkirin bi tundî tê aşkencekirin û tûşî azareke hovane dibe, jiyana xwe ji dest dide, û di hoyên xem û kulên giran de, xelkên bajar û bajarokê Rojhilatê Kurdistanê rabûne ser piyan û li dij vê tewana hovane ya karbidestên Îranê xwepêşandanên gelêrî birêve dibin, û kuştina keça Kurd a bêguneh şermezar dikin.

Li ser asta fermî û gelêrî, ev tewana reş, rastî protesto û şermezarkirineke berfireh hatiye, ji hêla xwe ve, Yekîtiya Netewan (UN) û hin dewletên cîhanê mîna Emerîka û Frensa jî, diltengî û şermezarkirina xwe sebaretî kuştina Jîna Emînî diyar kirine, ji bilî ku gelên Îranê bi hemû reng û netewên xwe ve piştgiriya xwe nîşan dane û derketine xwepêşandanên mezin.

Lê, kela dilê karbidestên Hikûmeta Tehranê bi kuştina keça Kurd a qurban hênik nebû, rabû bi tundûtûjî, bi zimanê guleyan, bi kuştinê têkilî bi xwepêşandanên Kurdistanê re kirin û xwîna welatiyan rijandin, hin kes şehîd û bi dehan jî birîndar ketine! Eve çar roj in ku xwepêşandan berdewam in û her diçe, xeleka wan li seranserî Îranê berfirehtir dibe, te gihaye Tehrana paytext û bêtir ji (15) bajarên din. Dengê xwepêşanderan bi van saloxanên jêr: (Mirin ji diktator re, Mirin ji Xamenî re, Mirin ji wîlayet el Feqîh re) bilind dibe!

Rijêma «Wîlayet El-feqîh» a diktatora ku ji /43/ salan ve destelatiyê li Îranê dike, siyaseteke tund, tekane û tepeserker li dij welatiyê Îranê birêve dibe. Bi behaneya ku welatiyek bi dijmin ve girêdayî ye, ew rikberên siyasî bi sêdaran ve darda dike, qeleziyê li xelkên Îranê dike û hawîr terora reş belav dike!

Ji bilî vê yekê, di wê dema ku gelên Îranê di rewşeke aborî ya zor û xirab de dijîn, hejarî û belengaziyê jiyana wan kiriye dojeh, hikûmeta Tehranê dirav û samana wan li welatine dûr xerc dike ku tu berjewendiya gel ne ji dûr, ne ji nêzîk ve têde tune ye, herweha, ew destêwerdanê li ser bingeha rêolî(mezhebî) di hundirê hin welatên herêmê de jî dike, ku bûye egera têkçûna aramî û aştiya wan welatan!

Di wê dema ku em tewana rijêma Îranê bi kuştina keça Kurd a bêguneh Jîna Emînî şermezar dikin, em piştgiriya xwe bi xwişk û birayên xwe re ku li hember siyaseta tunekirin û kuştinê serî hildane û têkoşîneke rewa dikin, nîşan didin û hevxemiya wan pareve dikin. Herweha, em bang li dewletên mezin ên cîhanê û rêxistina UN dikin ku ew bi erk û ustubarên xwe yên mirovane rabin, vê kuştina hovane ya bixwîn li ser gelê me, kesên me li Kurdistan Îranê rawestînin û kujeran radestî dadgeheke dadmend bikin, da ku bi serperiştiya rêxistinên navnetewî ew bêne darizandin û sezayê xwe bibînin!

- Rûmet û bilindî ji giyanê pakrewan Jîna Emînî û giyanên hemû pakrewanên ku li gastînên xwepêşandanan bi guleyên hêzên ewlehiya rijêmê ketine re!
- Nizmî û serşorî ji rjêma Tehranê re, ewa ku bi zimanê hesin û agir têkiliyê bi gelê xwe re dike!

21.09.2022 Z

**Komîta Rêzanî ya**
**Partiya Yekîtî Ya**
**Demokrat a Kurd Li Sûriyê**

**Bersiva PDKÎ li ser pîroznameya Partiya me sebaretî serkeftina Yekîtiya Herdu baskên wê**

------

Partiya Demokrata Kurdistana Îranê
Dîrok:01.09.2022

**Birêz Partiya Yekîtîa Demokrata Kurd Li Sûriyê**

Tevî silaveke dostane

Bi şanazî ve, peyama pîrozbahî û kêfxweşiyê a we bi boneya serkevtina pêvajoya hevgirtina refên Hizba Demokrat gihîşte destê me.

Di vê derheqê de bi navê PDKÎ em spasiya hesta hevxebatî û piştgiriya we bo serkevtina vê piroseyê dikin, û tevî giringdana bi peyam û naveroka peyama pîrozbahiya we, em radigihînin ku partiya me berdewam dibe li ser hestkirina bi berpirsatiya neteweyî, dîrokî û siyasî a xwe. Herweha PDKÎ bi pêdagirtina li ser prensîpên xwe ên demokratîk û mirovî, dê pêngavên cidîtir bavêje bo qahîmkirina refên xebatê bo gihîştina bi armancên tevgera me ya rewa. Herweha giringiyeke taybetî dide têkiliyên dostane, û hevxebatiya digel we û hemû dost û dilsoj û tlkoşerên riya azadiyê.

**Digel rêz û spasiya me a dubare**

**PDKÎ**

**Navenda Peywendiyên Giştî**

**Mihemed Nezîf Qadirî**

# Husên Hebeş mêvanê «NEWROZ» ê ye

*Helbestvanê Kurd ê navdar, Husên Hebeş, lawê bajarokê Şiyê/ Çiyayê Kurmênc/ Efrîn, ji çend salan ve penaberî welatê Almanya bûye. Di cîhana helbesta navnetewî de, weke helbestvanekî Kurd, ew xwedî cihekî berz, bilind û taybet e. Di aheng, festival û civînên helbestvanên cîhanê de her dem beşdar e, helbestên wî bi pir zimanan tên bîstin û xwendin, û eger ne bi navê Kurdistan be, ango mîna helbestvanekî ji welatê Kurdistanê bête vexwendin, ew beşdarî wê civînê nabe!*

*Bi kurtî be jî, em dixwazin xwendevanên NEWROZê Husênê helbestvan nas bikin, Husên Hebeş kî ye?*



**1. Pêşî, gelo bandora Kê-Çi li te bûye ku di navbera Husênê gencî ciwan û helbestê de evîn û hevaltî saz bibe? (Çi bûn ew tuştên bi rolekî mezin di kesatî, helbestvanîya te de pêkar kirine?)**

Gotin û axaftinên xweş û delal yên gundiyên min li havînê, li kolanan û li ser bêderan, û çêrokên zivistanê yên li ber agirê soba û pixwaran, ku min bi hezkirineke pir mezin lê guhdar dikir û wan bandorên mezin li min dikirin. Sadebûna diya min û tenikbûna dilê wê yê tije hezkirin, û heybet û serbilindiya bavê min jî bandora xwe li min kir. Di heman demê de bandora kaniyê, ya ku tîbûna zevî û baxçeyan vedimirand jî hebû. Stranên cîranê min Alîyê Ekêl û her wiha vegotinên wî yên balkêş, çîrok, destan û efsaneyên ku ji me re bi coşeke mezin digotin, bala min pir dikişandin, û di pê re, di jiyana min ya nivîsandinê de roleke pir mezin lîstin. Xwezaya balkêş û xweşik ya gundê Şiyê, gundê min û zeviyên zeytûnan yên bê dawî, rez, baxçeyên hêşîn û kesk, darên hinarê, hejîrê, gûz, merx, ba, heyam û herwiha çiyayê Hesîxidir û nîşa li ser, bandorên wan jî li ser nivîsa min hebûn û hîn jî hene. Zarokatiya min, lîstikên min, xewnên min, bîr û baweriyên min, dibistana min, hevalên min… Van hemûyan bandor li xewn û sawîrên min kirin, û bûn çavkaniyên dewlemend ku ez materyalên xwe yên afirêner û nivîsê jê werbigirim. Û pê re qonaxa zanîngehê jî di dewlemendkirina serpêhatiya min ya helbestî de roleke mezin lîst...

Her weha hebûna helbestvanê gewre Hemidê Bedrexan li gundê Şiyê, gundê min roleke pir mezin li min kir û bala min bi tevahî kişand ser helbestê û hişt ku ez di riya nivîsandina wê re herim, bi rastî ew weke mamosteyê min î yekem bû, lê di vî warî de hêjayî gotinê ye ku helbesta min ne weke helbesta wî bû, û helbesta wî tu bandor li helbesta min nekir, ji destpêkê de min ji xwe re riyeke cuda û dûrî riya wî girt û tê re çûm. Helbet ev hemû bûyer di destpêkê de bûn, di destpêka nivîsandinê de bûn.

**2. Berhemên te bi Çi zimanî ne? Destpêkê, niha, di festîvalan de…?**

Zimanên min yên nivîsandinê Kurdî û Erebî ne. Zimanê danûstandina bi cîhanê re Îngilîzî ye. Zimanên xwendinê ev her çar zimanan in. Di destpêkê de min bi Erebî nivîsî û çend berhem pê derxistin. Niha ez dikarin bêjim ku tenê bi Kurdî dinivîsim û min sê berhemên helbestan pê çap kirine. Di festîvalan de zimanê min zimanê Kurdî ye, û li kêleka zimanê Kurdî, wergerandina zimanê welatê ku ez lê bim. Hinek ji berhemên min bi zimanên Îngilîzî, Spanî, Çînî û Romanî hatine wergerandin û çapkirin. Hinek ji helbestên min bi qasî 30 zimanan hatine wergerandin. Hinek ji helbestên min di bêtirî 100 antolojiyên helbestî yên navneteweyî de hatine weşandin.

**3. Helbest, ne tenê gotin, terazû û wêne ye. Husên helbestê çawa dibînî, helbest çiye?**

Helbest danîna têkiliyeke kûr û hêja ye di navbera mirov û hebûna wî de ye, di nabera wî û gerdûnê de ye, di nabera wî û xwezayê de ye, û di nabera wî û derdora wî de ye, û bi vî awayî ew têgihîştin û haybûna hebûn û pirsgirêkên wê ye, ku ew bandoreke mezin li ser zanebûna mirovan dike û herdem wê zanebûnê hişyar dike û hişyar dihêle. Her wiha mirov dikare bêje ku helbest pirsan li dû pirsan dike û peyda dike, da ku trêna peyvan di rawestgeheke berdayî de raneweste û zingar jî lê negire. Helbest yekser têkiliyeke kûr bi giyanê mirov re dike û nirxê wî di ser hemû nirxan re bilind dike, loma ew weke agir, ax, ba, av û hêmanên hebûnê yên din, pêwîst e.

Helbest kaniyên jibîrkirî û girtî di zimên de der dike û peyvên zelal, sayî û nû peyda dike, û herwiha ew zimên geş, zindî dike û nahêle tucarî biweste, biqujmire û pîr bibe. Helbest .....

ronahî û tîrêj e, ew cihên tarî di giyanê mirov de diyar dike û derdixe holê, û çînên qalind yên nenas û yên veşartî radike, bi vî awayî ew ronahiyê dide wê nenasiyê û diyar dike. Helbest azadiyeke mezin e ku asteng û sînoran nas nake û napejirîne. Helbest xewn û sawîreke mezin e ku bi baskên ronahiyê li ezmanan difire û bi sîngeke nazik li erdê dine, û tiştên matmayî û ronahiyeke bêhempa dide me.

Helbest evîneke mezin ya ziman e ku ew mirwar, zêran û kevirên giranbiha bi ser me de dibarîne! Helbest dengê wijdan e û banga rastiyê ye, ew rastiya ku carcarina binpê û winda dibe, lê helbest wê rastiyê dike roka ku tucarî ji ser serê me winda nabe û bar nake.

Helbest sîwana me ye ku her dem hewl dide ku me ji korî, tarîtî û lalbûnê biparêze û deriyên girtî li pêşiya me veke. Helbest qîrîneke stûr e li hember zordarî, êş, birîn, çavbirçîtî, xapandin, sextekarî û biçûktiyê ye, qîrîneke stûr e li hember şer, kuştin, qirkirin û wêrankirina ku li ser mirovahiyê diqewimê ye... Herwiha helbest hebûneke bêdawî ye û bi çend pênasekirinan nayê sînorkirin û bi çend gotinan nayê zeftkirin û dorpêçkirin. Ji berî çend salan min nêzîkî sed pênaseyên helbestê nivîsandin û min li dawiya dawiyê nivîsand: Dibe ku helbest ev hemû pênaseyên min nivîsandin be û dibe ne ev hemû bin jî!



**4. Gelo çima Husên helbest nivîsand, ne çîrok, roman, pexşan, Şano yan bireke din a wêjeyê?**

Ji bo min nivîsandina helbestê bi hebûn û jiyanê ve girêdayî ye! Bê helbest ji bo min tu wateyên wê namînin! Helbest di giyan, xwîn, dil û hemû hebûna min de ye. Carekê min ji hevalên xwe yên helbestvan re wiha gotibû: Helbestvanino, helbestên xwe li ser milên xwe, li ser lingên xwe, li ser destên xwe, li ser piştên xwe, li ser stûyên xwe, li ser rûyên xwe, li ser çîpên xwe, li ser zikên xwe, li ser navikên xwe, li ser tiliyên xwe, li ser sîngên xwe binivîsin! Divê helbest bi goşt ve çesipî be, ji lêdana dil ve nêzîk be, parçeyek ji hilmê be, girêdayî giyan be, xwîna ku di damaran re diherike be... Ji ber vê yekê tu dibînnî, ez ewqas bi helbestê ve girêdayî me û bi coş û evîneke pir mezin wê dinivîsim, û nivîsandina wê xweştirîn tişt e li ba min. Ji ber van sedeman, min di warên din yên toreyê de yên ku te anîne ser zimên, nenivîsandiye.

Bêguman, sedemên din jî hene bi rewşê, bi dem û bîhnfirehiyê ve girêdayî ne... Ji bo nivîsandina helbestê tu pêwîstî bi rûniştina dirêj nîn e, pêwîstî bi lêkolîn, plansazkirin, vegotina dirêj û çavkaniyan nîn e, weke nivîsandina roman û şêweyên din ji wêjeyê. Tu dikarî helbestê di qehwexaneyan de, di meyxaneyan de, di trênan de, di otobusan de û heta di balafiran de jî binivîsî. Tu dikarî helbestê di dema seyranê de, di dema xebat û kar de, di dema hevdîtina bi hevalan re, di dema evîn, şahî, xemgînî, şikestin û rabûn û rûniştinê de jî binivîsî, ango li her cihî, di her dem û rewşê de tu dikarî binivîsî, tenê pêwîst e ku ew li deriyê te bixe û derbasî hundirê te bibe, û tu wê bigirî û binivîsî.

**5. Efrîna dagirkirî, wargehê jiyan û bîranînên te her dem û gav, bi te re, di aheng û civînan de beşdar e. Efrîn ji Husên Hebeş re çiye?**

Efrîn ji bo min ne tenê cihê jidayikbûnê ye, ne tenê mala dê û bav û kalan e, ne tenê cihê zarokatî, ciwanî û bîranînên min e... Efrîn can û giyanê min e ku min zindî dike û zindî dihêle. Ew pişika hilma min e, dilê ku di sînga min de lêdide û hezkirinê diafirîne û çêdike ye, ew hêza min e ku milê xwe didim ser û li ser piyan dimînim, ew sedema jiyana min û rewatiya hebûna min e, ew evîn, hêvî û roniya çavên min e, lewra ew herdem bi min re ye, li her cihên ku ez lê bim ew bi min re ye. Ew di qirika min de ye û li ser zimanê min e, ew di bêhna min de ye, di gotinên min de ye, di axaftinên min yên bi helbestvanên cîhanê re ye. Ew bûka Kurdistanê ye û xatûna bajaran e... Ji ber tiştên ku ji aliyê dewleta Tirk ya dagîrker û dûvik û çeteyên wê ve hatine serê Efrîna min, ew min gelekî xemgîn dikin. Ji ber ku tiştên bi ser serê mal û milk û gelê wê yê birûmet û qedirbilind ve hatiye, ew min pir xemgîn dikin. Ji ber talankirin, kuştin, wêrankirin, guhertina demografîk û wêrankirina sîstematîk û pilankirî ku her roj bi ser serê Efrîna min de tên, min pir xemgîn dikin. Ji ber van tiştan û tiştên din ku di Efrîna min de tên qewimandin, ez pir xemgîn im. Lewre ew dimîne doza min a herî blind û mezin ku ez bi xwe re hildigirim û li her derê êş û birîna wê vedirşînim û ji cîhanê re dibêjim.

**6. Helbesta Kurdî îro di kîjan asteyê de ye, û tu çi ji helbestvanên Kurd re dibêjî?** .....

8

Berevajî hinek hevalên helbestvan yên Kurd, ez dibînim ku helbesta Kurdî pir baş û xweş e û di cihekî bilind de ye. Di nav Kurdan de helbestvanên gewre hene ku bi evîneke pir mezin li ser helbestên xwe dixebitin, tîp bi tîp xwedî dikin û lê xwedî derdikevin. Pirsgirêka sereke ya helbesta Kurdî ew e ku tu sazî û dezgeh tune ne ku xwedî lê derkevin û bi rêkûpêk wê pêşkêş bikin. Weşanxaneyên rasteqîn nîn in ku wê çap bikin, reklama wê bikin û bala xwendevanan bikişînin ser. Tu rexnegir tune ne ku li ser rawestin û hêz û qelsiyên tê de ji hev cuda bikin. Rojname û kovarên taybet ji wê re tune ne...

Lê bi ser van hemû pirsgirêkan de jî pirsgirêka herî mezin ew e ku ew ji bo zimanên navneteweyî nayê wergerandin da ku cîhan nirxê wê nas bike û bi balkêşî bala xwe bide ser.

Tiştêkuezjihelbestvanên kurd re dibêjim? bi rastî ez naxwazim tiştekî bibêjim, ji bilî ku ji wan re başî, tenduristiyek baş û berdewamiya nivîsandinê dixwezim.

**7. Husên ê Kurd, gelek xelatên bilnd wergirtine, li pir fistîvalan heye. Gelo sedema geşbûn û çirisandina navê we di cîhana helbesta navnetewî de çiye?**

Ez nizanim! Ji min re zehmet e ku ez bersiva vê pirsê bidim. Belkî sedem ew e ku helbesta min ji aliyê cîhanê ve tê xwendin û ecibandin û belkî jî helbestên min ji bo gelek zimanên cîhanê hatine wergerandin, û belkî jî sedemên din hebin ku haya min jê tune ye. Lê ji bo min ya herî girîng ew e ku baş, kûr û bi bilindî binivîsim û di xebata nivîsandinê de berdewam bikim.

**8. Rewşa cîhanê îro di warekî dijwar re derbas dibe, mixabin ku bi agirê şer ê ku li gelek deverên cîhanê pêketiye, mirov, zarok, jin, pîr û kal têne kuştin, xweza dişewite û jiyan asteng dibe. Gelo, hûn weke helbestvanên cîhanê vê rewşê çawa dixwînin? Gelo çima dengê nivîskar, fêlesûf û helbestvanên cîhanê dijî şer, ji bo mafên gel û mirovan û avakirina aştî û aramiyê bilind nabe?**

Rewşa ku niha cîhan tê re derbas dibe pir xemgîn û têkçûyî ye. Cîhan bi tevahî dikele! Tu dikarî bêjî ku şer, gefdayîn, kuştin, wêrankirin, qirrkirin û pêxistina agiran li her derê ye! Dagirkerî, tûjî, pevçûn û qelebalixên penaberên ku ji dojehê bi hemû awayî direvin. Piraniya kesên ku niha pêşengiya cîhanê dikin, ne xwedî rûmet û moral in, berjewendiyên wan di ser her tiştî re ne, û ew cîhanê ber bi vemirandinê ve dibin, û belkî jî ber bi tunebûnê ve…! Bi tevahî rewşa cîhanê niha felaket e...!

Piraniya helbestvan, nivîskar, fîlozof û her kesê ku di cîhanê de têkiliya wî ya rasteqîn bi çandê re heye, li dijî şer, kuştin, zordarî û her tiştê ku rûmeta mirov û mirovahiyê biçûk dike, radiwestin û şermezar dikin. Bi sed hezaran helbest, nivîsar, gotar û nivîsên bi zimanên curbecur ku hene, şer û encamên ji wê peyda dibin şermezar dikin. Bi hezaran antolojî, vîdeo, çalakî, civat, proje, tevgerên helbestî yên navneteweyî, diyalog, platformên medyaya civakî hene ku şer şermezar dikin û ew li kuderê bin li kêleka bindestan in. Li cîhanê bi hezaran helbestvan û nivîskar hene ku dadikevin kolanan û beşdarî xwepêşandanên şermezarkirina şer dibin. Ez vê yekê dişopînim û baş dizanim. Ji aliyê min ve, dema ku artêşa tirk bi awayekî hovane êrîşî Efrînê kir, min bang li nivîskarên cîhanê kir ku hevgirtina xwe bi bajarê birîndar re bikin û êrîşa tirk û dûvçilkên wê şermezar bikin. Bêtirî 2000 nivîskar, helbestvan, fîlozof, şanoger, sînemager û wênekêş bangawaziya min îmze kirin û pişgiriya xwe diyar kirin. Piştî dagîrkirina Efrînê, min careke din bang li helbestvanên cîhanê kir ku li ser Efrîn û Kurdistanê binivîsin. Nêzîkî 80-ê helbestvanî bersiva banga min dan û nivîsandin. Min helbestên wan yên ku bi zimanên Îngilîzî û Spanî bûn, danhev û di antolojiyeke di bin navê «**Aştî ji bo Efrînê, aştî ji bo Kurdistanê**», û min ew li Berlînê weşand. Bi nihêrîneke biçûk li Înternetê, malper û medyaya civakî, hûnê di vî warî de bi gelek zimanên cîhanê hejmareke bê dawî ji helbest û nivîsan bibînin ku li dijî şer hatine nivîsandin. Lê di dawiyê de ez dibêjim û dipirsim, ma gelo gotin dê karibe çi bike li hember top û tivingan? Ma gelo dê helbestek li hember tank û balafir û bombebaran û rakêtan çi bike...?

Herwiha, hezkerên şer dê herdem şer gur bikin û bidomînin, û emê bi her awayî wan û şerê wan şermezar bikin û li dij bin.

**9. Gotina dawî… Dixwazî ji nifşê me yê nûhatî re çi bibêjî?**

Bi gelemperî ez ji şîretkirinan hez nakim, lê ez dikarim bi hezkirineke mezin û ji dil de ji nifşê me yê nû yê ku dinivisîne re bibêjim: Hevalno bi zimanê Kurdî, bi zimanê xwe yê dayikê binivîsin û wek me bi zimanên dagîrkerên welatê xwe nenivîsin, şaştiya ku me li destpêkê kiriye nekin! Pir bixwînin, bi gelek zimanan fêr bibin, berhemên xwe yên wêjeyî wergerînin zimanên cîhanê, ji ber ku bê werger tukes di cîhanê de dê we nas nake û bi nirxê nivîsandina we nizanibe.

Tucarî ji bîr nekin ku hûn .....

9

ji Kurdistanê ne û ji bilî Kurdistanê tu welatekî we yê din tune ye, li herderê divê ev yeka di bala we de be, û tucarî ji bîr nekin.

**10. Weşana NEWROZ, spasiya we dike ku we ev dema xwe ji xwendevanên wê re terxandiye. Her şad û li pêş bî.**

Ez jî we spas dikim û ji NEWROZÊ re herdem serkeftinê dixwezim.

Bonn 11.09.2022

---------------------------

**Husên M. Hebeş (Hussein Habasch):**

-Sala 1970 li gundê **Şiyê**, herêma **Efrînê** li **rojavayî Kurdistanê** ji dayik bûye.

-Ji dawiya 1996 de li Almanya dijî.

**Berhemên wî yên çapkirî ev in:**

1- **Noqbûna di nav Gulan de**/ weşanên Azmina li Urdinê û ji weşanên Alwah li Madrîdê (2002).

2- **Revyayên di çemê Êvrosê re**/ weşanên Sanabel li Qahîre (2004).

3- J**i dilbijînê bilindtir û ji newqa xezalê xweştir**/ ji weşanên Alwah li Madrîdê (2007).

4- **Windabûnên ji bo Selîm Berekat**/ ji weşanên Alzaman, Şam (2009).

5- **Firişteyê firyane (babetên li ser zarokên Sûrî)**/ ji weşanên Moment li Londonê (2013).

6- A **flying Angel (Texts about Syrian children) bi zimanê Îngilîzî/** ji weşanên Bogdanî li Albanya (2015).

7- **Xewnên di Dîwêr de**/ ev dîwana helbestvanê Albaî Jeton Kelmendi ye, min wergerandiye Kurdî - ji weşanên Bogdanî li Albanya yê (2015).

8- N**o pasarán “Derbas nabin”**/ bi zimanê Spanî, pirtûk ji hêla Festîvala Helbestê ya Navnetewî li Puerto Rico hatiye weşandin (2016).

9- **Dos arboles “Du dar”**/ bi zimanê Spanî, pirtûk ji hêla Festîvala Helbestê ya Navnetewî li El Salvador hatiye weşandin (2017).

10- **Tiempos de Guerra “Demên şer”**/ bi zimanê Spanî, pirtûk ji hêla Mala helbestê û ji hêla Festîvala Helbestê ya Navnetewî li Costa Rica hatiye weşandin (2017).

11- **Copaci Cu Chef “Darên sermest”**/ bi zimanê Romanî, ji weşanên Ars Longa li Romanya (2017).

12- **Taya Bîhokan**/ ji weşanên Sersera li Berlînê (2019).

13- **Berfa sor**/ bi zimanê Çînî, pirtûk ji hêla Festîvala Helbestê ya Navnetewî li Taiwanê hatiye weşandin (2019).

14- **Peace for Afrin, Peace for Kurdistan “Aştî ji bo Efrînê, Aştî ji bo Kurdistanê”**/ ev Antolojiyeke helbestê ye, navnetewî ye, bi zimanê Îngilîzî û Spanî ye. Min û helbestvana Taiwanî Miao Yi -Tu amadekiriye, tê de nêzîkî 80 helbestvan ji cîhanê beşdarbûne û hestên xwe li ser Efrîn û Kurdistanê nivîsandine/ ji weşanên Sersera li Berlînê (2019).

15- **Mirî di buhêrkan de gengeşeyê dikin**/ ji weşanên Al-Darawich li Plowdiw, Bulgaria (2020).

16- **Darên sermest**/ ji weşanên Sersera li Berlînê (2020).

17- **Kulîlka Espinillo/** bi zimanê Spanî, ev pirtûkeke hevbeş e bi helbestvana Kolombiyayî Bibiana Bernal re, ku ji hêla Weqfa Çandî ya bi navê Esteros ve li Arjantîna hatiye weşandin (2020).

18- **Bêzariya Peykerekî Westiyayî**/ ji weşanên Sersera li Berlînê (2021).

19- **A Rose for the Heart of Life**/ Helbestên bijarte bi zimanê Îngilîzî, ji weşanên Inner Child Press International li Amerîka (2021).

- Hinek ji helbestên wî wergerîne zimanê Îngilîzî, Almanî, Îspanyolî, Fransî, Farisî, Ozbek, Albanî, Rûsî, Romanî, Îtalî, Sirbî, Makedonî, Bulgarî, Polonî, Slovenî, Lîtwanî, Vîetnamî, Nepalî, Hindî, Malayalam, Bengalî, Tirkî, Berberî (Amazîxî), Boşnî, Portekîzî, Hungarî, Çînî, Yewnanî, Mandarin (zimanê Taywanê) û Tzotzil (zimanê gelên Mayan yên Meksîkayê).

- Helbestên wî di bêtirî 100 antolojiyên helbestî yên navneteweyî de hatine belavkirin.

- Xelata Helbestvanê Kurd yê Mezin Hemid Bedirxan, ya ku ji aliyê Yekîtiya Giştî ya Nivîskar û Rojnamevanên Kurd ve tê dayîn, wergirtiye. Her wiha xelata “Bosnian Stećak” Navneteweyî ya Helbestê, ku ji aliyê Yekîtiya Nivîskarên Bosna û Herzegovina ve tê dayîn. Xelata bronzî ya helbestê «Arîstoteles» ji festîvala helbestê ya navneteweyî ya Naoussa li Yewnanîstanê jî wergirtiye.

-**Beşdarbûna Festîvalên helbestê**:

Ew li 37 festîvalên helbestê beşdar bûye.

# Kêfxweşî... Şahî, Demkî Ne

**Nazdar Hesen**

Kêfxweşî bi gelemperî yek ji wan hestên mirovî ye, ku ji hundir û hinava mirov diherike, kêf û şahiyê dixe dilê wî û bi xwe re dil û hiş aram û rehet dike. Kêfxweşî ew hesta ku dihêle mirov bê bask bifire û jiyana wî xweşiktir derbas bibe. Pir tişt û sedem hene ku dihêle mirov kêfxweş bibe û dibe ku dilxweşiya wî ji bo serkeftin an ji bo wergirtina milk û mewalan be, yan jî ji bo kirina karekî jê hez dike, û dibe ku bi dîtina kesekî jê hez dike ve girêdayî be. Ji ber vê jî, em dikarin bibêjin, têgeh û pênaseya kêfxweşiyê li gorî her mirovekî cûda ye, û rêjeya wê di nav miletan .....

11

# Rojaneyên Efrîniyekî di bin siya dagîrkeriyê de... Gula dil «5»

**Osman Îso**



Şiyar bû û ji nijka ve li ser nivîna xwe rûnişt û bi lez hêz xwe kir û li ser pêyên xwe rawestî. Lingê xwe yê rastê di şewler re derbas kir lê peyîkê ling girit û berî wî bavêje ser erdê xwe bi kursiyê hilpesart û li ser kursiyê rûnişt û lingê xwe serast kir, lingê çepê jî di devlingê şewler de ma, bi hêrs devî tûrkî xeberan vekir û gotin wek sêmsoran ji tûr barîn û di pişt re kesereke kûr kişand û got:

Ax ax bila mirin heba û bila kalbûn tûneba! Li Nazê mêze kir, dît Nazê pişta xwe tê yal kirî û hişk di xew de ye... Li şewlerê xwe nihêrî û got:

Tu û Nazê ve wek hev namûsiz in, Nazê berê ji hembêza min dernediket, îro jî piştê xwe li min yal dike, berê ling hema bi derbekê re di şewler re derbas dibû, îro jî tev gurî kal bûye çete û mar xwe li ligî min dalîne, lê dawî dawî tê ser riya rast.

Şewler, saqo û şemlê li bejna xwe dûz dike û ji hundir mala xwe derdikeve. Li hemberê bavê Bilind li ser balkona xwe Qehwê vedixe û dibêje:

Sibeh bi sibeh Kalê Xel zû şiyar dibe, dar û kulîkên hewşa xwe av dide, di quncekê çepê de dareke zêtûnê heye, siya wê ji dîroka dagîrkeran mezintire, li aliyê cadê darên Lêmûn û Portiqalan sûre xemilandibûn, Yesmîn di dîwarî xênî re bi nepirçekan hildikişe û ne bes hewş û balkona min, lê cade jî tev mist bêhn kiriye…

Mala Kalê Xel du ode û salon in, lê hewşa wî pir mezin û fereh e, û mişt dar û ber e, lê yapicî û osteyên avahiyan wisa nafikirin, pere didin ser bedewbûnê û pir ne girînge kî wê bikire, hilweşîne û ji nû ve û bi rengekî din ava bike! Sirûda wan ew e.

{pere me re dibin cihê fereh} û eger qula wan jî fereh bibe ne xeme! Rojekê ez neçar bûm û bi cîranekî xwe re ez çûm cem kalê Xel, cîran di kalê Xel de reş û hişîn bû û kir û nekir ku kal razî bibe xaniyê xwe hilweşîne û li şûnê avahiyekê bilind bikin û ew çiqas pere dixwaze ne xem e û kîjan taqî dibe bila bibe, lê kal razî nebû û got:

Mala xwe ya Kurmancî bi sed taqî ez nadim, la win dixwazin min bi xwaşî di tirbê kin! odê taqan wek tirba ne… Bavê Bilind berdewam dike û dibêje: Baş e ew razî nebû ma aniha bêhna xweş wê ji ku ve bihata me, tiştê balkêş kalê Xel hemû dar û ber bi dînemo av didan bes dareke gulê li nêzî sûrê hebû wî ew gul bi destan av dida diçû ji sarîncê û bi wa temenî av hil dikişand û boş satilê dikir û ji satilê şerbik mişt av dikir, û bi eşiq ber ve gulê diçû û gula xwe av dida û stranên kevin dilorandin, lê deng pir ne zelal bû, û rojekê kalê Xel gotinek pir watedar kir û ew gotin ta niha bi mejiyê min ve zemiriye bûye benîşt: { Ez rûyê mala xwe ya kurmancî naguhêrim, berê hema hema rûyê her tiştekî «» bajêr, deşt, çiya û kêlikên tirban «» hatine guhartin û piştî ez mirim, çi dikin bila bikin va xanî dikin avahî, dikin Kazîno, dikin Mizgefit ew azad in lê dem tim hana namîne….}.

Kalê Xel ji hundir derket avdana dar û beran hêşt û yekser Satil mişt av kir û şerbe têda kir û gula xwe av da û got: Îro ez dereng mame, eger ji te re strana her roj bêjim, tê li min biborînî û dest bi strana xwe kir û got:

**Gulê gula minê,**
**nazdara dilê minê,**
**guharê Naza minê,**
**te nadim bi malê dinê**

**Koka dara gulê vedide,** axê serbinqotî hev dike pelên zer jê dike li aliyekî kom serhev dike, weke her car bihesret li koka dara hatiye birîn mêze dike û kesereke kûr dikşîne û dibêje :Te ji bîr nakim, te nehêşt ez bikevime, û tu ji min re bû pişt li hember van gurên ku xwe di cilên mirovahiyê de veşartine… Bîranîn weke birûskan di ber çavan re derbaz bûn û ronahî dane tîka dil… Lê tufe tenekî gemarê kir gava dît Sursurek di deriyê cadê re dixwaze derbasî gulîstana malê bibe, tavilê ew pelixand û got: Nazê bes te bidîta, çawa derbê mêran nabin didu... wa sursurê genî bîranînên kalê Xel bi der kirin û hate bîra wî çawa awciyan newêrîn bi şert û mercan bi wî re daketina, awciyan tim derdidan…Kalê Xel di gelî û newalan re mîna hespekî rewan digeriya, Kew çiqas sivik in, lê qurşîn û nîşan a wî ji Kewan siviktir bûn, qurşîn nedibûn didu. Rojekê ew di ser Kewekî re rawestî û got:

Ha ha la tu çiqas fodil û şêrînî lê tu bêhişî, teyrî baz gava tê girtin serî wî dikin tûrekî berî wî di qefesê kin, çima? Ûştê xwe nekuje…Lê tu! Tu hîn dike qebqeb û tu bi wê nakî jî, lê tu hîn hevalên xwe jî bi ber dehvan dixwî û tu dixwazî wan weke xwe bikî kole… Ax kewo dijminê xweyo… Deriyê hundir nîvkêşî bû, li hundir nihêrî, dît qîtên Nazê ji bin mitêlê bi derketine xwazî daqirtand û got: Ê DUNYA, Nazê ya min îro qûna xwe di min yal dike û hişk xew dike… bi hêrs kêzike sursur e çekir cadê û .....

**Kêfxweşî ... Dûmahîk**

de tê guhartin. Ango miletin hene ji miletên herî kêfxweş tên nasîn û bi xwe şahiyê dixin jiyana xwe û jiyana xwe xweştir dikin. Bêguman ev nayê wê wateyê ku ew di demên bi êş û jan re derbas nabin, an derbas nebûne.

Miletin hene em dikarin bibêjin wek miletên me yên Rojhilata Navîn çanda kêfxweşiyê li ba wan yek ji wan huneran e, ku ew bîriya wê dikin ji ber ku em miletekî bêtir di xewnan de dijîn, û bi xwestekan ve girêdayî ne, kedê didin û wextê nabînin şahiyên xwe pêk bînin û her tim ji sîbera şahiyê ditirsin û her gav kêfxweşiyên me bi xemgîniyê re têkildar in, mîna ku ew bingeha em li ser mezin bûne û hatine perwerdekirin, hîn tê bîra me ku çawa dayîkên me ji kenên ji dil ditirsîn û digotin: Xwedê xêr ke, dê tiştekî ne baş were serê me, şahî demkî ye tenê bişirîn bes e! Belê rast e kêf û şahî demkî ne, lê her wiha jarî û xemgînî jî demkî ne, û ji ber vê jî divê em rojên xwe bijîn û ji her tiştekî biçûk an mezin kêfê bistînin, û ne hêlin ku kêf û şahî ji me birevin, û her tim dema xwe bi girî û nalînkirina rojên borî winda nekin, pêşeroj hîn nehatiye, lê ya niha ew e ku divê em bijîn.

**Rojaneyên ... Dûmahîk**

got: Here la teve refî xwe bibe, win ji gemarê çê bûne, ji gemarê hez dikin û bê gemar win najîn û eger min tu nekuştiba tê bi xwe bimriya ji ber ku win di paqijiyê de najîn û berê win li ba me tunebûn lê bûye demeke win pir bûne, bes bi pirbûnê xwe pir şa me be, hevalên te ên duling û pêxas roja wan jî nêzîk buye û dawiya wan eger ne wek te be ê ji te pîstir be… Berî Kalê Xel deriyê cadê bigre giropekî çekdar di wir re derbas bû û dît çawa kalê Xel termê sursur çe dike cadê dilê wan êşiya û kezeba wan şewitî têbê mirîyek ji malbata wan ne, û yekî ji wan got: Hecî qe ne heram e tu qet ji Xwedê natirsî ev ajilê bêguneh te kuşt? ma çi ziyan bi te kiribû? em kanin anha te bavêjin zîndanê bi tewanbara tu terezuya jîngehê hildiweşînî!.

**Evîn Berazî ... Dûmahîk**

- Evîn dimîne (يبقى الحب)
- Dîsa Destpêkirin (Starting Over)

Herwisa derhêneriya komeke belgefilman kiriye, weke: Şam di çavên dildarên wê de (دمشق في عيون عشاقها), û Ji cîhana zarokan (من عالم الأطفال) , û karên wê rengereng in di navbera drama (şanogeriya telivizyonî û sînemayî, ji bilî kar di derhêneriya belgeyî de.

Li ser Sêyem Festîvala Kobaniyê ya Sînemayî ya Navnetewî, hunermenda me wiha dibêje:

Festîvala Kobaniyê ji min re pir bi wate bû, ez seroka wê ya xula duwem bûm, û di xula sêyem de, endama komîteya rêvebir û seroka Komîteya Navbênkar bûm.

Di xula derbasbûyî ya festîvalê de, me weke rêvebiriyê ji hêla diravî de fînanz kir. Di çend xalan de, me karîbû pêşxistinê têxin festîvalê, û ji hêla beşdariya filmên kurdî yên ku nirxeke fikrî û nameyekê li xwe digirin ku Karin alîkaiyê di avakirina sînema kurdî de bikin.

Me hewl da ku festîvala Kobaniyê ya sînemayî Navdewletî pêşxistinê di hêla rêxistinî de jî li xwe bigire, û ji hêla beşdariya pirtirîn afirênerên filman, derhêner û rojnamevanan de.

Serokatiya Komîteya Navbênkar derfet da min ku gelek filman temaşe bikim û rengên cuda yên derhêneriyê nas bikim, û di nerîna min de festival demsal in rastî ne bo naskirina derhêneran, hunermendan, ekteran û ragihêneran, ku giringtirîn alavên afirandina bûyerê ne, afirandina sînemayê bi giştî û belavkirina wê.

Bi giştî ez kêfxweş im ku festival navê bajarê min Kobanî hildigire, û ew jî ji min re şanazî ye û watedar e ku navê wê di dilê Ewrupayê de bilind dibe di.

Komîteyê Navbênkariyê ya Festîvala Kobanîyê ya sînemayî ya Navneteweyî ya sêyem:

Evîn Berazî serok, û bi endametiya:

1-Zanyar Mihemmedîniko - Rojhelat

2- Ardîn Dêrîn - Bakur

3- Betal Silêman - Rojava

4- Meryem Ehmed - Sûriyê

5- Serdar Zengene - Başûr

**Xelatên festîvalê:**

1- Xelata baştirîn filmê drama ji bo filmê: Fifth Narcissus

2- Xelata baştirîn Belgefilm (Documentary) ji bo filmê: The Kurds in Egypt through the ages

3- Xelata baştirîn filmê Animation (vejandin/vejîn) ji bo filmê: Night

4- Xelata baştirîn Derhênan ji bo filmê: Quarantine

5- Xelata baştirîn senaryo ji bo filmê: Peľe

6- Xelata baştirîn lîstikvan ji bo: Said Darif - di filmê «Charter» da

7- Xelata baştirîn aktrîs: Rozhan Hamajaza - di «filmê: I will wait» da

8- Xelata baştirîn wênegir ji bo filmê: Allegoria

9- Xelata Rêveberîya Festîvalê ji bo filmê: The Pandemic

**Gotina dawî:**

Spasiyeke germ bo te mamoste Arif Hiso, Rojnameya Newroz û xwendevanên wê, û hêviya serkeftinê ji we re bo xizmeta huner, çand û sînemaya kurdî dixwazim.

# Ji Kobanê ...
# Hunermenda Kurd Evîn Berazî kî ye ?

**Arif Hiso**



Evîn Berazî derhênereke sînemayî kurd e, bawername di derhêneriya sînemayî de ji zanîngeha Beyrûtê bi dest xistiye. Herwisa bawernameya alîkar di bazirganî û aboriyê de standiye, û di yekîtiya festîvalên navnetewî ya sînema erebî de, ew berpirsa ragehandinê ye. Evîn, çend xelatên navdewletî bi dest xistine, ji wan:

- Xelata baştirîn filmê Animation di festîvala eskinavî (Eskendînavî) ya navdewletî de li Finlandayê.
- Xelata Komîteya Navbênkariya di festîvala Hamburgê ya filmê kurdî di xula nehemîn de.
- Bawernameya rêzgirtinê ji festîvala sînema ya Silîmaniyê li Herêma kurdistanê wergirtiye.
- Herwisa, berî çend rojan filmê wê Dîsa Destpêkirin (Starting Over) bo xelatên festîvala Londonê ya filmên kurdî hate helbijardin.

Evîn, seroka FestîvalaKobaniyê ya sînemayî navdewletî duwem de û seroka Komîteya Navbênkariyê di xula sêyem de bû.

Evîn weke endameke Komîteya Navbênkar di çend festîvalên erebî de beşdar bûye, û bi derhênerin sûrî navdar re weke cîbicîkar û alîkar; mîna Nezîr Ewad, Mihemed Elşêx Necîb, Samir Berqawî, Mahir Gedo, Qeys Elşêx necîb û hinin din re, hejmarek filmên belgekirinê û vejandinê) derhênaye. Aniha, di kenala Danimarkî DKSYD de kar dike, û hejmareke kurtefilm jî derhênaye, ji wan:

- Rawestgeheke taybet (موقف خاص)
- Ji kesekî xwedî serbor bipirse (اسأل مجرب)

..... 11

# Elî Riza Erselan bi dilekî kul radihêje hestiyên kurê xwe yê kuştî !

Berî 7 salan, dezgehên ewlehiya dewleta Turkiyê ciwanê nûhatî Hakan Elî Erselan/ Erzrom, bi guleyan kuştin û termê wî radestî malbata wî nekirin. Li roja 29.08.2022 Z, bi şêweyekî hovane, dûr ji nirxên mirovatiyê, li dadgeha Amedê, hestiyên Hakan di sepetekê de radestî bavê wî kirin û li Erzrûmê hate veşartin.

Ev wêneya dilêş, ku bavek hestiyên kurê xwe yê kuştî li ser dest bin û diçe ku wî veşêre, bê tu gunehê wî ji bilî ku ew Kurd e hebe! Ev wêne, xemsariya civaka navnetewî û hovîtiya



dewleta Turkiyê diyar û nîşan dide!

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**